

Ravekirina hedarkirinê

Ev belavok rave dike ka hedarkirin çî ye û çawa tê bikaranîn û divê hûn kengî hewceya wê bin. Herwiha ew li ser sûd û talûkeyên bikaranîna hedarkirinê rave dike û ka wê çî jê were pê hesîn.

Ya girîng ew e, ew ji we re dibêjin ka hûn ê hewceyê çî bin ji bo amadekirina lênihêrîna xwe piştî hedarkirinê.

Ew ji hêla dêûbavan, anesteziştan û nûnerên nexweşan ên ku bi hev re dixebitin ve hatiye nivîsandin.

Bi piranî dermanê hedarkirinê di demarê we (IV an jî bi rêya rehan) re tê kirin, lê hin caran ew bi rêya dev (devkî) an jî bi rêya rûpoşekê tê dayîn.

Hedarkirina demarî çî ye?

Da ku we sist bike hedarkirina demarî tê pêkanîn dema ku dermanê hedarkirinê di nav demarê we re bi rêya boriyekê tê kirin.

Navê 'hedarker' ji pisporê çavdêriya tenduristî re ku vî karî dike tê gotin.

Ew li ser dayîna mêjera rast ji dermanê hedarkirinê û bi rêvebirina hemû bandorên alî tîr perwerdekirin û rahênan. Li odeya emeliyatê, pir caran hedarker anestezişt e. Di dorhêlên din de, dibe ku ew hemşîr, neşterkar an jî bijîşkekê/î pispor be. Wê hedarker di dema çarekirinê de bi tevahî bi we re bimîne.

Sê astên cuda yê hedarkirina demarî hene. Navê wan wisa tîr: Hedarkirina 'herî kêr', 'navîn' (hin caran jê re hedarkirina hişiyar tê gotin) û 'kûr'.

- **Hedarkirina herî kêr**– wê hedarker mêjereke kêr ji dermanê hedarkirinê bide we. Hûn ê sist bibin û ji ber tiştên ku li derdora we diqewime kêr xembar bin, lê hûn ê hişiyar bimînin û wekî herdem biaxavin. Gengaz e ku hûn ê çarekirina xwe bi bîr binîn lê ne hemû hûrgiliyên wê. Divê hedarkirina herî kêr bêhnkişandina we bandor neke.

- **Hedarkirina navîn (hedarkirina hişiyar)** – wê hedarker hinek zêdetir ji dermanê hedarkirinê bide we û bi wî awayî hûn ê sist û gêj bin. Dîsa jî ya girîng ew e ku wê hedarkera/ê we jî bikaribe bi we re biaxive û hûn ê jî bikaribin rêbazên hêsan bişopînin. Dibe ku hûn hin beşên çarekirina xwe bi bîr bînin. Divê hedarkirina navîn bêhnkişandina we bandor neke.
- **Hedarkirina kûr** – wê hedarker mêjereke zêdetir ji dermanekî an gelek dermanan bide we da ku we bike hûn di navbera dema çarekirina xwe de xew bikin. Tê pêşbînîkirinê kê bijîşka/ê we bi we re di dema çarekirina we de neaxive. Dibe ku bêhnkişandina we were bandorkirin û wê hedarkera/ê we li we binêre û heger pêwîst be jî wê alîkariya we bike. Hin caran dibe ku hûn tişekî ji çarekirina xwe bi bîr bînin. Li Keyaniya Yekbûyî divê hedarkirina kûr ji hêla karkerên ku asta wan a rahênan û jêhatiyê wek anesteziyê be were rêvebirin.

Hedarkirina devkî çi ye?

Hin caran dibe ku ev cure ji hedarkirinê ji mirovên gelek xemgîr re berî anesteziya gelemperî bikêrhatî be, lê bi piranî ev yeka bi xwe ne bes e ku we di emeliyatekê de sist bike û vehesîne. Heta bandora wê were cih divê biçekî dem derbas be û dibe ku standina mêjera rast zehmet be wek ku ew li gorî heryekî cûda ye.

Ji kerema xwe heta ku hûn forma xwe ya destûrê îmza nekin berî ketina nexweşaxaneyê, ji bijîşka/ê xwe ya/ê gişfî nexwezin ku bila ew ji we re dermanê hedarkirinê yê devkî binivîse, çimkî dibe ku ew yeka fikirkirin û biryardana we bandor bike.

Girîng e ku gava ku hûn bi bijîşka/ê xwe re bicivin hûn bikaribin bi zelalî bifikirin da ku hûn li ser talûkeyan gotûbêj bikin û formê destûrdayînê jî ji bo emeliyat an rê û rêbazên din îmza bikin.

Gelo cûdahî di navbera hedarkirin û anesteziyê gelemperî çi ne?

Va ne cûdahî di navbera hedarkirin û anesteziya gelemperî:

- asta hişiyariya we
- pêwîstiya amûrên ku alîkarî di bêhnkişandina we de dikin
- bandorên alî yên gengaz

Bi bikaranîna hedarkirina herî kêr û navîn hûn ê gêj, rihet, xilmaş û sist bibin, lê di nav pêkanîna emeliyatê de hûn ê hişiyar bimînin.

Bi bikaranîna anesteziya gelemperî, hûn ê di dema emeliyatê de bi tevahî bêbizav û nehişiyar bin. Hedarkirina kûr di navbera herduyan de ye.

Gelo di bin hedarkirina demarî de çi ji çarekirinan ve dibe werin pêkanîn?

Gengaz e ku gelek çarekirinên biçûk bi hedarkirina demarî werin kirin. Çend mînak:

- biyopsiyên çerm an memikan
- tamîrkirina biçûk a hestiyên şikestî
- neştera biçûk ji bo çerm, dest an jî pî
- rê û rêbazan ji bo venaskirina pirsgirêkên ku bi zik (endoskopî), sîh (bronkoskopî), qolon (qolonoskopî) û mîzdankê (sîstoskopî) ve tîr girêdan
- rakêşana diranan an jî çarekirinên diranî yêr din
- emeliyatên çavê, wekî rakirina katarakt.

Gelo sûdên hedarkirina demarî çi ne?

- Ew bilez bandor xuya dike û dibe ku mêjera dermên a rast lê bîne.
- Ew we dike ku hûn di navbera çarekirina xwe de sisttir bin. Dibe ku ew tê vê wateyê jî ku hûn ê pir kêr di derbarê çarekirina xwe de bi bîr bînin.
- Li gofî hin rê û rêbazan, ew rê li ber pêwîstiya anesteziya gelemperî digire, çimkî dibe ku ew ji bo nexweşên bi hin pirsgirêkên bijîşkî nelicîh be.
- Bi piranî bandorên alfî yêr wê ji yêr anesteziya gelemperî hindiktir in.
- Başbûn ji hêla hedarkirina demarî ve ji anesteziya gelemperî bileztir e, yanî heger hûn baş bihesin, hûn hema hema dikarin di navbera saetekê de vegehin mala xwe.

Gelo talûkeyên hedarkirina demarî çi ne?

- Dibe ku rêjeya bêhnkişana we hêdî bibe. Ev di hedarkirina kûr de tiştêkî giştî ye, lê çi gav dermanê hedarkirinê were bikaranîn talûkeyeke heye. Heger pêwîst be, hedarker di temaşekirina we de jîr e û dikare alîkariya we di bêhnkişana we de bike.
- Giştî ye ku xwînpeştana we dakeve, lê ji bo çarekirina vê jî hedarker hatiye rahênan.
- Dibe ku nexweşbûn û vereşîn li we werin lê ev yek ne pir gengaz e.
- Pir kêr e ku karvedanên hestokî ji ber dermanên hedarkirinê çêbin.
- Dibe ku gerisandîneke biçûk li şûna derziyê li we derkeve.
- Piştî dibe ku hûn nikaribin li ser piyan baş bisekinin û dibe ku hûn di talûkeya ketina erdê de bin û bi taybetî heger hûn bi emir mezin bin.
- Dibe ku hedarkirin heta 24 saetan biryardan û bîra we bandor bike.

Gelo berguherên hedarkirinê çi ne?

- **Anesteziya gelemperî:** hûn ê di navbera kirina dermanê hedarkirinê de bi tevahî nehişyar bin û tu tiştî ji wê rêbazê bi bîra xwe neynin.
- **Anesteziya herêmî bêyî hedarkirinê:** hûn ê di navbera çarekirina xwe de bi tevahî hişyar bimînin û rihetî bin. Dibe ku perdeyêke li pêşiya we were bicihkirin da ku we nehêle ku hûn emeliyatê temaşe bikin.

Gelo kê/î biryar dide heger hedarkirin li min were kirin an na?

Di dema nixandinê de hûn dikarin vebijêrka hedarkirinê an bi bijîşka/ê xwe an jî bi hemşîreyê re gotûbêj bikin. Heger ew ji we re nehatibe peydakirin, hûn herdem dikarin bipirsin ka standina wê gengaz e an na.

Heger hûn bi rewşên bijîşkî yê heyî re di bin talûkeyeke de bin, wê bijîşkên we bi we re li ser vebijêrkan gotûbêj bikin û hûn ê bi hev re bikaribin li ser biryarekê werin.

Ez ê werim hedarkirin, ka divê ez çî bikim beriya ku ez werim li nexweşxaneyê?

- Heger tu kesên we ku hûn li wan dinêrin hebin, wek mînak zarok an kesên mezin, divê hûn bi kesekê/î din re biaxavin ji bo ku ew li wan heta roja pê miqate bin.
- Divê mirovekê/î giştî û li ser xwe we an bi erebê an jî bi teksiyê – wê baştir be bê raguhastina giştî – vegeîne malê. Ji ber ku dibe ku bandorên hedarkirinê heta 24 saetan bidomin, divê ew di tevahiya şevê de li wir bimînin û li we binêrin.
- Hemû dermanên xwe tev amûrên bêhnkiştanê bi xwe re li nexweşxaneyê bînin.
- Heger hûn nexweş bin, bi sermê ketibin an ducan bin, ji kerema xwe bi nexweşxaneyê xwe re têkevin têkiliyê çimkî dibe ku hedarkirin li we ne ewle be. Dibe ku emliyata we ji nû ve were sazîkirin.
- Bila bijîşka/ê we di roja emeliyatê de bizanibe heger hûn zarokên xwe dimêjînin an na.
- Beriya hatina li nexweşxaneyê – tevî jêxistina cîlaya neynokan û zêr û cewheran – serçavên xwe ji makyajê jî paqij bikin. Hûn dikarin gustîla zewacê li xwe bihêlin.
- Bi xwe re kincên fireh ên wek kirasê xewê an jî ji hiriya pezî bînin da ku we rihet û germ bihêle. Pêlavên pan ku pêkirina wan hêsan e pêkin.

Gelo ez dikarim beriya hedarkirina xwe tiştêkî bixwim û vexwim?

Wê klînîk an jî nexweşxane şîretê bidine we ka hûn ê kengî xwarin û vexwarinê rawestînin.

Bi piranî wê ji we were xwastin ku hûn şeş saet beriya emeliyata xwe xwarinê rawestînin, lê hûn dikarin heta du saetan beriya emeliyatê şilavên zelal vewxin. Şilavên zelal ên ku hûn dikarin vexwin ev in; av, ava fêkî ya ronkirî û çaya reş an jî qehwe (bêyî şîr an qeymax).

Heger nexweşiya şêkir bi we re hebe, divê hûn ji bo şîretên taybet li ser dema birina dermên û rawestandina xwarin bipirsin.

Gelo wê beriya emeliyatê çî biqewime?

Hûn ê bi piranî kirasê xewê li xwe bikin. Gava ku hûn bigihîjin odeya emeliyatê wê hedarker amûrên temaşekirinê bi we ve bixe. Wê amûra bikaranî bi emeliyat û cûra hedarkirinê ve were girêdan û di nav wan de bi piranî ev in:

- bazinê xwînpestan
- amûra li ser beşa jorîn ji singê we ji bo tomarkirina kutekute dil
- gustîla ji bo pîvana astên oksîjenê yên we.
- boriyeke zirav û plastîkî ku mêtjera duanoksîda karbon a hûn berdidin derve dipîve. Ev bi piranî bi rûpoşa oksîjenê ve girêdayî ye.

Gelo çawa dermanê hedarkirina demarî tê dayîn?

- Hedarkirin bi rêya derziyekê ku di nav demarê li ser milê we an jî li piştê destê we tê dayîn. Hûn ê di navbera emeliyatê de li gorî pêwîstiya xwe ji wê zêdetir bistînin. Di hedarkirina kûr de hûn ê bi piranî û bê sekinandin dermanekî di nav demarê we re bistînin.
- Hûn ê bi piranî oksîjenê an bi rêya boriyekê plastîkî di nav pozê we de an jî bi rêya rûpoşê bistînin.

Gelo bandora dermanê hedarkirinê çî ye?

Ew li gorî mêtjara dermên di navbera ên distînin de cûda ye. Hûn ê di navbera hedarkirina kûr de di xewê de bin, lê di hedarkirina sivik de hûn ê bi piranî bi kêfxweşî bi rihet bihesin.

Gava ku me ji çend nexweşan li ser bandora hedarkirinê pirsî, wan besiva me wisa dan:

'Min xwe dît ku min ji xwe ve çûyî û di nav xewn û xeyalan de bûm'

'Min fikirî ku ez di emeliyatê de hişiyar bûm, lê ez hin caran nêzan ketim piştê ji nişkê ve saetek derbas bibû'

'Ez ji dil vehesîm û şa bûm'

'Ew tiştê ecêb bû – ez ji tiştê ku li dora min diqewimîn pir veqetandî bûm.'

Gelo ez kengî dikarin vegerim malê?

- Heger li we hedarkirina sivik an navîn hatibe kirin, hûn dikarin bi piranî di saetekê ji dermankirina xwe de biçin malê.
- Heger li we hedarkirina kûr hatibe kirin, wê başbûna we di navbera saetek û du saetan de bidome. Gava ku hûn bikaribin biçin malê dibe ku ew pir caran bi başbûna pê emeliyatê ve girêdayî be.

Gelo tu şîretên girîng piştî dema emeliyatê hene?

- Wek ku berê hatibû gotin, wê hewce be ku kesekê/î mezin û li ser xwe we bi erebê an bi teksiye bibe malê – û wê baştir be bê bikaranîna veguhastina giştî – û bi we re jî di tevahiya şevê de bimîne. Heger rêkeftin nehatibe kirin ku kesek piştî dermankirinê bi we re bibe, dibe ku hûn piştî emeliyatê nikaribin vegehin malê.
- Dibe ku hedarkirin we nehêle hûn baş li ser piyên xwe bisekinin. Ji kerema xwe li ser derenceyan hişyar bimînin û heger hûn xwe bêserûber hîs bikin divê kesek bi we re hebe.
- Dibe ku biryardayîna we piştî dermankirina we heta 24 saetan bandor be, ji ber vê yekê divê hûn di wê demê de biryarên girîng nedin. Di bikaranîna medyaya civakî de baldar bimînin.
- Pêdivî ye ku hûn di navbera 24 saetan de venegerin ser karê xwe, li kesên ku pê ve girêdayî ne nenêrin, ajokariyê nekin, xwarinê çênekin an jî li ser makîneyekê nexebifînin. Dibe ku derketina dermên ji bedena we ve 24 saetan bidomîne.
- Piştî emeliyatê divê hûn 24 saetan alkol venexwin an hebên razanê nebin.
- Wê bijîşka/ê we şîretên nivîskî der dermankirina li malê bide we.
- Wê nexweşxane jimarayeke telefonê bide we ku hûn bi wan re têkevin têkiliyê heger rewşa we li malê ne baş be.
- Heger piştî emeliyatê hûn xembar bin, xwe nebaş hîs bikin, an jî hûn nikaribin vê jimarê bibînin, hûn dikarin bi bijîşka/ê xwe ya/ê giştî re têkvin têkiliyê an 111 lêxin, an jî heger hewce be bi kesekê/î mezin û li ser xwe re ber bi beşa qezayê û lezgin a herêmî biçin.

Pirsên ku hûn dibe ku bixwazin ji anestezişt/ê xwe bipirsin

- 1 Gelo wê kê/î dermanê hedarkirinê bide min?
- 2 Gelo hûn çî pêşniyar dikin, hedarkirin an jî anesteziya gelemperî?
- 3 Gelo wê tu talûkeyên taybet li min werin?
- 4 Gelo divê ez kengî dev ji xwarin û vexwarinê berî hedarkirinê berdîm?
- 5 Gelo divê ez kengî werim birin?

Bandorên alî, tevlihevî û talûkeyan

Di anesteziya nûjen de pirsgerêkên bitalûke pir kê in. Talûke nayê rakirin bi tevahî, lê derman, amûr û rahênanên nûjen di salên dawî de kirin ku anestezi bibe rêbazeke ewledartir.

Anestezişt pir miqate ne ku xwe ji hemû talûkeyên ku di vê beşê hatine destnîşankirin dûrbixin. Wê anestezişt/ê we bikaribe agahiyên zêde li ser van talûkeyan û rêbazên parêzkirinê bide we.

Mirov di awayê şirovekirina peyv û hejmaran de ji hev cûda ne. Ev pîvan ji bo alîkariyê tê peyda kirin.



Herwiha hûn dikarin agahiyên zêde ji rûpelên agahiyên nexweşan li ser malpera Kolejê bibînin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo

Çavkaniyên zêde

- Lênihêrîna kesa/ê ku bi anestîkeke giştî an jî hedarkirineke standibe (www.rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation)
- Pîveran ji bo Hedarkirina Şiyar di Beşa Lênihêrîna Diranî de Koleja Qiralî ya Nişterkarên Inglîstanê û Koleja Qiralî ya Anestezîstan. RCoA2015 (<http://bit.ly/2T2mZh6>).
- Rênişandanan li ser Peyda kirina Xizmetên Hedarkirinê. RCoA2016 (www.rcoa.ac.uk/gpas).
- Rahênanên Hedarkirina Ewle ji bo Rêbazên Çavdêriya Tendurîstî: Pîver û Rênişandanan. Akademiya Kolejeyên Bijîşkî û Qiralî AoMRC 2013 (<http://bit.ly/301ndq8>).

Hûn dikarin agahiyên zêde di belavokên din de li ser malpera Kolejê bibînin www.rcoa.ac.uk/patientinfo. Dibe ku ew belavok li nexweşxaneyê we di beşa anesteziyê an jî di klînîka pêş-nirxandinê de berdest bin.

Talûkeyên ku bi anestezîka we ve girêdayî ne

Herwiha belavokên di derbarê talûkeyên taybet yê ku bi anestezîk an bi anestezîkirinê ve girêdayî ne li ser malpera Kolejê berdest in: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/risk-leaflets. Ew li ser belavokên agahiyên nexweşan ku li jor hatine navnîşankirin zêde dikin.

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwîrek neyê bidesthîlgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran jî alî wergervanên jî civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tînen çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta ji dest tê tînen venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ka ji me re bêjin hûn bi çi difikirin

Em li pêşniyaran jî bo baştirkirina vê belavokê pêşwazî dikin.

Heger tu şiroveyên we hebin, ji kerema xwe wan jî me re bi rêya emailê bişînin: patientinformation@rcoa.ac.uk

Koleja Qiralî ya Anestezîstan

Churchill House, 35 Qada ionêrê Sor, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Yekem 2018

Wê ev belavok jî roja weşanê ve di nav sê salan de were nixandîn.

© 2018 Royal College of Anaesthetists

Ne qedexeyê ku ev belavok jî bo hilberîna materyalên agahiyên nexweşan were kopîkirin. Ji kerema xwe ve jî vê çavkaniyê resen bigirin. Heger hûn dixwazin beşek jî vê belavokê di weşanxaneyêke din de bikarbînin, divê piştrastkirineke lîcîh were dayîn û logo, marqeyê û wêneyê jî werin rakirin. Ji bo agahiyên zêde ji kerema xwe ve bi me re têkilî deynin.